


Hejmara - 187

Bê dirave

# MIZGÎN

1 Tîrmeh 2025



# Naverok

- 1 Wênesazî
- 2 Wêjeya Zarokan
- 3 Lîsk
- 4 Welatê me
- 5 Tu dizanî
- 6 Tendirustî
- 7 Tîp û gotin
- 8 Navdar
- 9 Bexçeyê Navan
- 10 Jîngeh mala me ye
- 11 Jêhatiyên Zarokan
- 12 çîrok
- 16 Bixwînin û fêr bibin
- 17 Çavika Mizgîn

Amadekirina Naverokê  
Amir Ferso

Dîzayn  
Mecid Alsadûn

Şêwekar  
Umer Ishaq  
Xalid Bîco  
Baran zagros  
Rojhilat

Sererastkirina Kurdi  
Mihemed Xanim








Sererastkirina Erebî  
Abdulah Rehîl

 Kovara Mazgîn

 Kovara Mazgîn مجلة مزكین

Ji bo xêzkirina deve gavên li jêr bişopîne

اتَّبِعِ الْخَطَّاتِ التَّالِيَةَ لِرَسْمِ الْجَمَلِ.



*Hebû tunebû, di hundirê pênûsdankeke de jêbir û pênûs hebûn.*

*Jêbirê silav li hevalê xwe pênûsê kir.*

*Rojbaş hevalê min ê hêja, tu çawa yî?*

*Pênûs:*

*Ez ne baş im û bes silavan li min bik, ez ji te xeyidî me*

*Jêbir:*

*Çima! Tu wisa bi min re daxive pênûsa delal, em heval in û doza me yeke.*

*Pênûsê lê vegerand û got:*

*Na, em ne heval in û doza me ne yeke, tiştê ez dinivîsim tu yî jê dibî.*

*Jêbirê got:*

*Na, ez wisa nakim; ez tiştê şaş jê dibim.*

*Pênûs pir bi tengezarî got:*

*Ev ne karê te yî.*

*Jêbir:*

*Ev karê min, karê te bedewtir dike, eger tu bixwazî rastiyeke binivîse ez jî alikarim bi tunekirina şaştiyan.*

*Pênûsê serê xwe rakir û got:*

*Rast e, tu rast dibêjî hevala min.*

*Jêbirê got:*

*Hîn tu ji min acizî?*

*Pênûs:*

*Na, ez nema acizim xema mexwe havalê hêja, lê bala min li te yî tu roj bi roj kin dibî*

*Jêbirê:*

*Tu rast dibêjî, yê ku kar sererast dike û şaştiyan jina bibê béguman wê di vê têkoşinê de nixê giranbuha bide.*

*Pênûsê jî wisa got:*


*Ez jî roj bi roj kin dibim*

*herdiwan bi hev re gotin em ê nikaribin*

*guhertin û rastiyan bipêşbixin ku em*

*fedekariyên mezin nekin.*

Werger ji çîrokên cîhanî  
Xorşîd Xalid





Her çar  
cudahiyên di navbera  
her du wênayan de  
bibîne.

أَوْجِدِ الْفُورُوقَ الْأَرْبَعَةَ  
بَيْنَ الصُّورَتَيْنِ.





## Girê Xuweyra

# تل خويرة

Ew li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, dikeve navbera bajarê Serêkaniyê û Girê Spî de. Ev kevintirîn cihe ku mirov lê niştecih bûye û çandinî kiriye. Ew yek ji girên arkeolojîk e û şahidiya şarîstaniyek mezin ku beriya 5 hezar sal li vir hebû, kiriye! Wek şarîstaniya Akadî, Mîtanî û Suryanî.

Zanyaran li Girê Xuweyra bermahiyên xaniyan, perestgehên ku ji heriya pijyayî hatine çêkirin û tiştên malê; weke cerên neqîşandî, amûrên xwarinê û peykerên biçûk, dîtine.

Û ji van hemûyan jî girîngtir, nivîsên bi tîpên mîsmaîrî yên li ser tabletên ji heriyê! Van nivîsan alîkariya zanyaran kir ku jiyana mirovan a beriya hezaran sal, nas bikin.

يقع تل خويرة في إقليم شمال وشرق سوريا، بين مدينة سري كانية وكري سبي/تل أبيض، وهو من أقدم المناطق، التي سكنها الإنسان وزرع فيها الأرض.

وهو واحد من التلال الأثرية، وشاهد على حضارة عظيمة، كانت هنا قبل قرابة 5,000 سنة! مثل الأكادية، والميتانية، والآشورية.

وجد العلماء في تل خويرة؛ بقايا منازل، ومعابد مبنية بالطين المشوي، وأدوات منزلية، مثل جرار خزفية، وأوانٍ للظهو، وتماثيل صغيرة.

وأهم من هذا كله، كتابات مسماوية على ألواح طينية! وهذه الكتابات ساعدت العلماء على فهم حياة الإنسان قبل آلاف السنين.



**Kund çavên xwe nagerîne! Lê ew dikare serê xwe heta 270 dereceyan bizivirîne da ku her tiştî li dora xwe bibîne!**

**أن البوم لا يحرّك عينيّه! لكنّه يستطيع إدارة رأسه، حتّى 270 درجة ليرى كلّ شيءٍ حولّه!**

## Tu dizanî? هل تعلم؟

**Heşt pê sê dilê wî hene! Û dema avjeniyê dike dilê wî yê sereke disekine.**

**وَأَنَّ الْأَخْطَبُوطَ لَدَيْهِ ثَلَاثَةُ قُلُوبٍ! وَعِنْدَمَا يَسْبُحُ، يَتَوَقَّفُ قَلْبُهُ الرَّئِيسِيّ عَنِ النَّبْضِ!**



# PAQIJIYA DIRAN

## نظافة الأسنان



Diranên te beşek ji kenê te yê bedew e. Lênêrîna wan, wan ji xerabûnê diparêze, paqijkirina diranan wan xurt û saxlem dike. Lîstoka firçeyê çêke. Devê xwe li ser çar beşan dabeş bike (Jorçep, jêrçep, jorrast û jêrrast). Ji bo paqijkirina her beşekî 30 çirkeyê destnîşan bike. Straneke kin hilibijêre û hin tevgerên firçeyê yên xweş bikar bîne. Her beşek bi dawî bû, ji bo paqijkirina beşê din jimartina jor ber bi jêr ve bikar bîne. Bi vî awayî em ê saxlemî û sipîbûna diranên xwe biparêzin.

أسنانك جزء من ابتسامتك الجميلة، والعناية بها تحميها من التسوس، وتنظيف الأسنان جيدًا يجعلها قوية وصحية. اصنع "لعبة الفرشاة". قُم بتقسيم فمك إلى أربعة أجزاء (العلوي الأيسر، والعلوي الأيمن، والسفلي الأيسر، والسفلي الأيمن)، وخصّص 30 ثانية لتنظيف كل جزء بدقة. اختر أغنية قصيرة وأضف حركات مَرِحَة بالفرشاة مع الإيقاع. كلما انتهيت من جزء، ابدأ العدّ التنازلي للجزء التالي! وهكذا نحافظ على سلامة أسناننا وبياضها الناصع.



أَصْدِقَائِي الْأَعْزَاءَ، أَكْمِلُوا  
الْحُرُوفَ النَّاقِصَةَ؛ لِتُكْمَلُوا  
الْأَسْمَاءَ حَسَبَ صُورِهَا.



			ا
			ل
			ح
			ي
			و
			ا
			ن
			ا
			ت





## Reşîdê Kurd

## رشيد كرد

Nivîskar û têkoşerekî Kurd e, di sala 1910'an de li gundê Roşad ê navçeya Dêreka Çiyayê Mazî ya Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye. Di derdoreke ku ji zanîn û azadiyê hez dikir de mezin bû û ji zimanê xwe yê kurdî pir hez dikir.

Reşîd Kurd gelek pirtûk û gotar bi zimanê Kurdî nivîsandin. Dîwaneke wî ya bi navê "Kerwan" û dîwaneke wî ya bi navê "Ez" hene. Di helbestên xwe de ji bo bilindkirina ala rizgariyê li dijî neheqî û zordariyê pesnê şoreş û şoreşgeran daye. Di pêşxistina rêzimanê kurdî de keda wî hebû, lewra (Rêzimanê Kurdî) nivîsand.

Nivîskar û têkoşer Reşîd Kurd di sala 1986'an de koça dawî kir û li bajarê Amûdê hat oxirkirin.

Ji bo rêzgirtina li têkoşîn û keda wî, di sala 2011'an de Navenda Reşîd Kurd a Çandê li bajarê Amûdê hat vekirin.

کاتب و مناضل کوردی، وُلد عام ١٩١٠ في قرية روشاد، التابعة لمنطقة ديركا جيایي مازي في باکور کردستان. نشأ في بيئة محبة للعلم والحرية، وكان يحب لغته الكرديّة كثيراً. كتب رشيد كرد العديد من الكتب، والمقالات باللغة الكرديّة، له ديوان بعنوان (Kerwan - القافلة)، وديوان بعنوان (Ez - أنا) وكان في أشعاره يتغنى بالثورة، والثوار لأجل رفع راية التحرير ضد الظلم والاضطهاد، وسأهم في تطوير قواعد اللغة الكرديّة فألف (قواعد اللغة الكرديّة). توفّي الكاتب والمناضل رشيد كرد عام ١٩٦٨ ودفن في مدينة عامودا. في سنة ٢٠١١م أسس مركز رشيد كرد الثقافي في عامودا تكريماً لنضاله، وتخليداً لذكراه.

**Hin Navên**

**bi tîpa - W**

**Wan**

**Welat**

**Weşkar**

**Wezdar**

**Wardoz**

**Warşîn**

**Warvîn**

**Wend**


**Weysî**

# Paqijî û jêhatî حماية البيئة

Ciwan xweşava porteqalan vexwar, paşê qutî avêt ser rê! Hevala wî Şîrîn qêriya "Na". "Werin em parastina paqijiya rê bikin, çima em wê nekin fiştekek kêrhatî!"

Şêrînê qutî hilgirt û guldanek jê çêkir û got; Ma tu dizanî ku tenekeyên alemînyum, cam û qutyên şîr, li şûna ku bibin çopê, dikarin ji nû ve wan bikar bînin?

Ciwan: Ramanekê baş e. Di cara bê de ez ê pêndankekê jê çêkim û pêndê xwe bixêmê.



شربت جوان عصير البرتقال، ثم رمى القلعة في الطريق!

"لا!!" صاحت صديقته شيرين.

"لنحافظ على نظافة الطريق، لم لا نحولها شيئاً مفيداً!" حملت شيرين القلعة، وصنعت منها مزهرية، وقالت: هل تعلم أن علب الألمنيوم، والزجاج، وعلب الحليب يمكن إعادة تدويرها بدلاً من أن تتحول إلى نفايات؟

جوان: نعم، هي فكرة مبدعة، وفي المرة القادمة سأصنع منها محفظة لوضع أقلامي فيها.

## Yaqûta biçûk...Hunermendek ji Quneytera




Alyaqût Seyîd Siwêd temenê wê 9 salî ye, ji parêzgeha Quneytertayê ye û di pola sêyem a qonaxa seretayî de dixwîne. Peşdarî sembizyona Tebqayê a 2025'an bû û tabloyek bedew bi navê "Keçek Ji Reqayê" pêşkêş kir. Yaqût di malbateke hunerî de hatiye dinê û heskirina wênesaziyê ji dayika xwe ku ev zêdeyî 20 salan e mamosteya wênesaziyê ye, girtiye. Ew bi dayika xwe re serdana pêşengehan dîke û ji zaroktiya xwe ve wênesaziyê dîke. Dema temenê wê 6 salî bû, dayika wê pêşengehek taybet jê re organîze kir, di pêşengehê de 24 tabloyên ku bi tiliyên wê yên nazik hatine xêzkirin, hatin pêşandan. Yaqût tekez kir ku temen ji hunerê re tune ye.


الياقوٲٲ سييد سويد، عمرها تسع سنوات، في الصف الثالث الابتدائي من محافظة القنيطرة، شاركت في سبوزيوم الطبقة عام 2025م، الذي أقيم برعاية هيئة الثقافة في إقليم شمال وشرق سوريا، وقدمت لوحة جميلة بعنوان "فتاة من الرقة".

ياقوٲٲ وُلدت في بيت فني، ورثت حب الرسم من والدتها، التي تعمل مدرسة فنون منذ أكثر من 20 عاماً. ترافق والدتها إلى المرسم والمعارض، وتمارس الرسم منذ صغرها. وعندما كانت في السادسة، نظمت والدتها معرضاً فنياً خاصاً لها، ضم 24 لوحة من رسوماتها! بألوانها الصغيرة وألوانها الجميلة، وقد أثبتت ياقوٲٲ أن الفن لا عمر له.

Çîroka : Rêwîtiya li ber çem









Ev çem wekî neynikeke  
zelal bû, em dikarin  
bihêlin ku careke din jî  
wiha be.




Em bi ser ketin!



Ev çi cihekî  
bedew e.



Silav! Ji kerema  
xwe re paqijiya  
çem biparêzin.





Nan  
نَنْبُرُ  
Bread



Goşt  
لَحْمٌ  
Meat



Mêwe  
فَاكِهَةٌ  
Fruits



Sebze  
خَضْرَاوَاتٌ  
Vegetables

# Çavika Mizgîn عدسة مزكين



العدد - 187

مجاناً

# مزكبي

1 - تموز - 2025

